**RÊVEBERIYA CIWANAN- Û PERWERDEHIYÊ**

**2017-09-28**

Kurmanji

# Agahî ji bo parastvanên ku li pêşdibistanê xwedî zarok in

## Belgekirina pedagojîk a dîjîtal a li Şaredariya Bollnäs'ê

Li pêşdibistanê, pêşdeçûn û hînbûna her zarokê divê li pêş çavan be. Çalakî divê bi awayekî domdar bên raçavkirin, da ku em bikarin dahûrînin û binirxînin bê ka em çi dikin. Nirxandin alîkariyê didin me ku em pê hêmin bin ku çalakiyên pêşdibistanê bi kêrî hemû potansiyela peşdeçûna zarokê tê.

Li pêşdibistanên Şaredariya Bollnäs'ê, ev nirxandin bi awayekî dîjîtal, bi rêya amraza IT a bi navê Unikum tê pêkanîn. Eger hûn parastvan in, hûn dikarin çalakiyên pêşdibistanê bişopînin, li gel agahiyên pêşdeçûn û hînbûna zarokên xwe. Xebatkarên pêşdibistanê dê Unikum'ê bi kar bînin ji bo ku bi we re (parastvan) bikevin nav têkiliyê.

## Pirs û bersivên gişt î

### Unikum çi ye?

Unikum platformeke dîjîtal e ku tê de (bo nimûne) cihê ji bo nameyên heftane, menûyên xwarinê, bername, nirxandinên me û yên zarokan, vebeyîn û belgekirina roj-bi-roj ku bi şiklê têketina blogê ya ji çalakiyên li pêşdibistanê hene. Hûn ê bibînin ku çalakî çawa bi bernameya pêşdibistanê re têkildar in, bo nimûne bê ka em pîlana çi dikin ku li pêşdibistanê pêk bînin. Hûn dikarin zarokê xwe bişopînin û bi rêya wêne, belgekirin û vebeyînan lê binêrin ka koma pêşdibistanê çi dike.

Wek her car, gava ku hûn hatin û we zarokê xwe li pêşdibistanê wergirt hûn ê bi devkî agahiyan bistînin. Dema hûn gihîştin malê, hûn dikarin Unikum'ê bi kar bînin, bixwînin û li wêneyan binêrin, û zarokê we dê bikare ji we re bibêje ka me bi hev re wê rojê li dibistanê çi kir û çi tecribe kir.

### Kî dê agahiyên derbarê zarokê min û derbarê min bibîne?

Wek parastvan, hûn dikarin bibînin ka kîjan zarokên din di nav koma zarokê we de ne û parastvanên zarokên li pola zarokê we kê ne, û hûn dikarin agahiyên derbarê komê tev bistînin.

Bi tenê hûn, parastvan, û mamosteyên berpirsiyarê koma zarokan dikarin belgekirinên hînbûn û pêşdeçûna zarokê xwe yê li pêşdibistanê bibînin. Çi parastvan nikarin xwe bigihînin belgekirinên pêşdeçûn û hînbûnên derbarê zarokên din.

Belgekirinên li nav Unikum'ê bi tenê ji bo şexsên berpirsiyar in. Lewre, divê hûn fotograf an jî belgeyan bi şêweyên din, wek medya civakî yên wek Facebook an jî Instagram kopî nekin, parve nekin an jî bi kar neynin.

### Agahî bi awayekî ewle tên veşartin?

Agahî li ser înternetê bi awayekî şîfrekirî tên şandin, her wekî banqeya înternetê.

Hemû parastvan ji bo têketinê divê e-nasnameyê/NasnavêBanqê bi kar bînin.

Serverên ku agahî tê de hatine veşartin li navendên baş-çavdêrîkirî û baş-parastî hatine bicihkirin. Sîstem ji aliyê xebatkarên pispor ên şixul bi şev û roj tên çavdêrîkirin, û agahî bi domdarî tên destegkirin. Sîstem ji aliyê dîwarênagir tên parastin.

### Çima Jimareyên Nasnameyê yên Şexsî (jimareyaşexs) tên bikaranîn?

Ewlekarî- û pêwîstiyên şexsîbûnê girîng in, lewma Jimareyên Nasnameyê yên Şexsî tên bikaranîn, her wekî ew ji bo xizmetên banqeyan ên li ser înternetê an jî ji bo Saziya Parastina Civakî bên bikaranîn, bo nimûne.
Jimareyên nasnameyê yên Şexsî niha li hemû pêşdibistan û dibistanên welêt tên bikaranîn ji bo ku xwendekarên beşdarî hemû pêşdibistan û dibistanan dibin bên naskirin, û her wiha ji bo nasandina bi rêk û pêk a parastvanan. Jimareya Nasnameyê ya şexsî pêwîst e da ku bê zanîn ku agahiyên derbarê zarokê we bi parastvanê rast ve hatine têkildarkirin.

Ji ber ku agahiyên nav Unikum'ê dê agahiyên şexsî bihewînin, Şaredariya Bollnäs'ê divê li gor Qanûna Daneyên Şexsî (PDA) tevbigere, di demeke nêzik de jî divê li gor Qanûna Parastina Daneyan be.

### Belgekirinên derbarê zarokê min ji bo çiqas demê tên veşartin?

Belgekirina derbarê zarokê we li heyama ku zarokê we li pêşdibistanê be dê bê domandin. Eger zarokê we pêşdibistana xwe biguherîne di nav sînorê Şaredariyê de, belgekirinên zarokê we dê bi wî/wê re bê.

### Razîbûn tê xwestin?

Ji ber ku Unikum amraza ku Şaredariya Bollnäs'ê ji bo belgekirina hînbûna hemû zarokên pêşdibistanê bijartiye, razîbûna ji hêla we (parastvanan) ji bo vê yekê pêwîst nake. Em êdî li şûna kaxez û pênûsan amrazeke dîjîtal bi kar tînin.

Mamoste dê wêneyên zarokên we bêxin nav belgeyên zarokê we bi xwe. Dîsa jî, eger bixwazin wêneyên zarokên we bêxin nav belgeyên koma pêşdibistanê, ku hemû parastvanên nav komê dikarin bibînin, divê hûn razîbûna xwe nîşan bidin. Hûn dikarin vê yekê li gel xebatkarên pêşdibistanê bi rêya forma ji bo deng, fîlm û îmajên li ser medya civakî, înternet û agahiyên çapkirî jî pêk bînin

## Zanîna girîng

### Belgeya gîştî

Belgekirina pedagojîk belgeyeke gîştî ye. Li gor rêgezên gihîştina gîştî ya bi belgeyên fermî, mimkun e ku mirov belgeyên gîştî yên nav destê Şaredariyê bixwaze. Eger şexsek belgekirineke pedagojîk bixwaze, nirxandineke veşartûbûnê tê pêkanîn, vêca agahiyên hesas, eger ku hebe, tên jêbirin, beriya ku belgekirinek bê şandin.

### Agahiyên hesas

Belgekirinên pedagojîk li pêşdibistanê ji aliyê xebatkaran tên nivîsandin. Tişta ku tê nivîsandin divê agahiyên hesas negire nav xwe.

### Wate û etîket – Agahiyên girîng ên li ser qadên metna serbest!

Belgekirina dîjîtal dibe ku qadên metna serbest bihewîne. Qadên metna serbest divê pênase û nirxandinên taybetiyên takekesî yên şexsan nehewînin. Destûra îfadeyên tawanbar jî nayê dayîn. Ev yek ji bo hemû kesên ku Unikom'ê an jî amrazên din ên dîjîtal bi kar tîne derbasdar e.

### Agahiyên din

Eger derbarê belgekirina pedagojîk de bêtir pirsên we hebin, hûn dikarin bi xebatkar an jî rêveberê pêşdibistana xwe re bikevin nav têkiliyê.

## De niha destpê bikin!

Hûn dikarin an bi rêya kompîtira xwe an jî bi sepanên ji bo telefonên jîr an jî tabletan amadekirî xwe bigihînin Unikom'ê.

Biçin navnîşana https://start.unikum.net/ an jî sepana Unikom'ê daxînin ser telefona xwe ya jîr an jî tableta xwe. Dema hûn hatin wir, 'bi şiklekî din têkevê' bibijêrin (*Andra sätt att logga in*), û piştre 'Şaredariya Bollnäs' (*Bollnäs kommun*) vebijêrin. Piştre, bi bikaranîna Jimareya Nasnameya Banqê an jî Jimareya Nasnameya Banqê ya Mobîl têkevinê. Dema ku mamosteyên koma we ya pêşdibistanê tiştekî têkildarî we wek parastvan an jî têkildarî zarokê we lê bar bikin, hûn ê di sepanê de hişyariya vê yekê wergirin.

Di www.unikum.net de, hûn dikarin derbarê vê bêtir tiştan bixwînin, fîlmên agahdariyê bibînin, şîroveyên parastvanên pêşdibistanên din ên derbarê vê amrazê bixwînin.

Hûn dikarin li ser malpera me ya webê: http://www.bollnas.se/index.php/unikum agahiyên piştgiriyê, fîlmên agahdariyê û bêtir tiştan peyde bikin

Em bi bikaranîna vê amrazê li benda serdemeke hîndar in!